04.07.2020
Rûpela 1 ji 3yan

Pressestelle Staatskanzlei
40213 Düsseldorf
Têlefon 0211 837-1134
0211 837-1405
yan 0211 837-1151

presse@stk.nrw.de
www.land.nrw

**Danxuyandina Çapemenîyê**

# Sekreterê Eyaleta Herêma Guterslohê Guler: “Li vê derê tiştên talûtêr tên kirin – lê ev ji bo siyaseta entegrasyonê gazîkirineke şîyarbûnê ye.”

**Navenda entegrasyonê ya Dezgeha Bajarvanîyê û dezgehên entegrasyonê di pandemîya koronavayrusê de nemaze bi navgînîya zimanên cuda peyderkirina destekê dewam dikin**

**Wezîrîya Zarokan, Malbatê, Bextxwazan û Entegrasyonê vê xuyandinê eşkere kiriye:**

Serap Gulera Sekretera Eyaletê ya Berpirsîyara ji Entegrasyonê ji bo li ser xebatên gava pandemîya koronavayrusê zanyarîyan fêr bibe; çûye serdana du dezgehên entegrasyonê yên li herêma Guterslohê komeleya firehîya rêncberan (AWO) OWL e.V-yê û Westfalen-Lippe e.V-ya yekîtîya DRK-ê ya eyaletê û navenda entegrasyonê ya dezgeha bajarvanîyê.

Sekretera eyalete Guler vê daye zanîn: “Bi mebesta têkbirina pandemîya koronavayrusê li herêma Guterslohê desteka zû û sade ya ji alîyê beşên dezgeha bajarvanîyê yên bi hevkarî kar dikin divên bên pîrozkirin. Mineta ji ber xebatên dezgehên DRK û AWO-yê yên entegrasyonê û navenda entegrasyonê ya dezgeha bajarvanîyê li ser serê min û çavê min. Di hevdîtinên li qadê de nexasim ji bo kesên ji başûrê rojhilatê Ewropayê hatî min dît ku xêrxwaz û wezîfedar xwe fîda kirine. Ev fîdakirin ji bo kesên bandordîtî gelek bifeyde ye. Vêga gelek giring e ku nexasim mirov zanibin ji ku derê alîkarîyê û zanyarîyên bistînin.”

Ji alîyê navenda entegrasyonê ya dezgeha bajarvanîyê ve ji bo welatîyên Bulxaristan, Polonya û Romanyayê toreke alîkarîyê ya belaş hatiye sazkirin û ji kesên gerîyayî re bi zimanê wan li ser koronavayrusê zanyarî tê dayîn. Ji bilî van di nava vê de mijarên karpêdanê jî hene.

Li herêma Guterslohê, DRK, xasma ji bo mirovên di karantînayê de bi alîkarîyê, tedarike û testê ve mijûl e. Wezîfeyeke din a giring jî konsolîdekirina xêrxwazên li qadê ye. Dezgeha entegrasyonê ya AWO-yê, OWL e.V. vêga bi tedbîreke ku ji bo mirovên di karantînayê de ne bi pakêtên hevkarîyê peyder dike destekê dide wan. Ji bilî van ji bo kesên bandordîtî kempeynên xêrxwazîyê jî bi rê dixin. Di qadê de ji bo karina pêşkêşkirina xizmetên xuyandî pêdivêyên dibin piştî karantînayê peyder bibin jî tên anîn pêş çavan.

Li herêma Guterslohê belavbûna pandemîya di berhemanîna goştî de carekê din nîşan dide ku rexşa karpêdanê ya nexuyayî çawa nahêle mirov bi civatê re entegre bibin.

Rewşên heyî yên li ser şîrketên Tonnies û yên taşeron serêşer û sebebekî mezin ê şermezarîyê ne. Hin ji rêncberên fabrîqeyê yên ji cîhên cuda yên dinyayê hatî bi salan di îzolasyonê de bêyî têkilîkirina bi civatê re jîyane.” Sekretera Eyaletê Guler xuyandina xwe weha dewam kir: “Em bi kêmayî dikarin ji şîrketan bixwazin ew ji bo hînbûna zimên û tevlîbûna jîyana civatî keysê bidin rêncberên biyanî.”
Bakurê Ren-Vestfalyayê yekane eyalet e ku xwedîya navendên entegrasyonê yên dezgehên bajarvanîyê ye. Di seranserê eyalete de 54 avahî, ji bo zarok û nûgihayîyên serbuhurîya wan a bextxwazîyê heye bi mebesta çêtirkirina şansê wan hînkarîyê xizmetan pêşkêş dike. Ji bilî van ji bo entegrasyonê û jîyana pirrcûrîyê çalakî û xizmetên dezgehên bajarvanîyê û yên dezgehên taybet bi rê dixin. Ji sala 2015an ve navendên entegrasyonê yên dezgehên bajarvanîyê

KOMM-AN NRW wek perçeyekê bernameya eyalete li qadê ji bo welatîyên bi bextxwazan re kar dikin destekê dide.

Eyalet, ji bilî van, ji 186 navendên entegrasyonê yên Freie Wohlfahrtspflege NRW pereye wan dide re destekê dide. Ev di seranserê eyalete de di cîhên civatî de li gora pêdivêyan xizmetan pêşkêş dikin. Dezgehên entegrasyonê li qadê bi xizmetên koçberîyê û dezgehên, dezgehên bajarvanîyê re ji nêzîk ve kar dikin. Ji ber ku nêzîkî mirovan û derdora xwe ne dikarin ji mebestan re alîkarîya guncayî pêşkêş bikin.

**Çavê we di înternetê de li me be:**

Twîtter: @chancennrw
Facebook: Chancen NRW
Înstagram: chancennrw
YouTube: Chancen NRW

***Eger çi pirsên we hebin ji kerema xwe bişînin nivîsîngeha çapemeneyî ya Wezîrîya ji Zarokan, Malbatê, Bextxwazan û Entegrasyonê Berpirsîyar e - têlefon: 0211 837-2417.***

***Ji bilî vê yek dikare ji vê sîteya înternetê ya Birêvebirîya eyalete jî xwe bigihînê vê metna çapemenîyê: www.land.nrw***

***Siyaseta veşarîbûnê ya çapemenîya civatî***